Utlendingsdirektoratet
Norwegian Directorate
of Immigration

# Daxuyanîya şexsî li ser dahatî û samanî

**Pêşnav**

**Paşnav**

**Jimara -DUF**

Tu wê qanûnên piştgiriya aborî û hevpêçên hemî alîkariyên pereyî li (peyrewê paran) li vir «Reglement for økonomiske ytelser til beboere i statlig mottak» peyda bikî.

Heke te bi xwe pere jibo jiyarê nebin UDI wê bi tenê piştgiriya aborî ji te re bide. Heke te dahatî (dexil) û/ yan saman (serwet) hebe mana wê ew e ku te bi xwe tijî yan hinek perên jiyarê hene. Wê demê tu nikarî piştgiriya aborî wergirî, yan em wê wê li dû ka dahatî û/ yan samanê te çendê mezin e kêm bikin. Heke dahatiyê me’aşê te pir be, herwisa daxwaza dana kirêya xanî jî wê ji te bî kirin.

## Me agahdar bike ka te dahatî yan saman heye

Jibo ku em bikarin piştgiriyeke aborî ya dirust ji te re bidin, divê tu kampê pê agahdar bikî ka te dahatî yan saman heye. Tu wê wî tiştî bi rêya îmzakirina vê daxuyaniya şexsî bi cîh bînî. Ew agahdariyên wilo wê bi tenê jibo hejimartina piştgiriya te ya aborî bêne bi kar anîn.

## Belgenameyê nîşan bide

Dema kamp daxwazê ji te dike, divê tu belgenameyê nîşan bidî ku şertên wergirtina piştgiria aborî hîna ji te digirin. Heke tu wê belgenameya UDI-yî ji te daxwaz dike nîşan nedî, ew piştgiriya te ya aborî wê bê rawestandin.

**Tu divê van belgenameyên xwarê nîşan bidî**

- kopiya axir kaxeza me’aşê te, heke te dahatiyê me’aşî hebe
- kopiya kontrakta karî, heke te dahatiyê me’aşî hebe
- çapkiriya hesaba bankê ya ku hesaba mayî ya meha dawiyê nîşan dide, heke te hesaba bankê ya norwêcî hebe
- çapkiriya desthelatdariya taybetî bo hilsengandina bacê û dahatî ji tesfiya hesaba sala dawiyê
- kurtiyek ji NAV li ser her alîkariyeke pereyî ya zemaneta civakî ya van 12 mehên dawiyê

## Daxuyaniya şexsî

☐ Ez di daxuyaniya şexsî û manaya wê digehim , û li dû baştirîn şiyanên xwe min agahdariyên dirust dane.

☐ Min agahdarî li ser her samanekî û/ yan dahatiyekî ji kampê re dane. Heke ew dema ez li kampê dijîm samanek û/ yan dahatiyek bi dest min bikeve, li ser min erk (wacib) e ku ez kampê bi wê yekê agahdar bikim, digel peydakirina belgenameyên pêdivî. Heke gohurînek di dahatî û/ yan samanê min da çê bibe ez ê eynî tiştî bikim.

☐ Ez ê pê agahdar im ku heke ez emden zayariyên nerast li ser dahatî - û/yan rewşa samanê xwe bidem yan agahdariyan li ser wan ragirim, çêdibe li cem polîsî şikayet li min bê kirin.

☐ Ez dizanim ku heke ez agahdariyên nerast bidem yan agahdariyan li ser dahatî- û/ yan rewşa samanî ragirm, çêdibe alîkariyên pereyî kêmtir lê bihên yan hema wan ji dest bidim.

Tarîx

______________________________

îmzaya kesê ku daxwaza penaberiyê dike

______________________________

îmzaya karmendê kampê